Nordkurdiska
Bra bostad

Xaniyê baş mafê her kesekî ye

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Ji bo me Sosyaldemokratan xanenişîn mafek civakî ye. Divê her kesek li Swêdê xwedî mercê xaniyê ewle, baş be her wisan jî bi lêçûnek normal be. Ji bo ku em bikaribin li jiyanê rewş û mercên wekhev û rewa biafirînin, dewrûberên xanenişîniyê grîng e ji bo me. Ji lew re li bazara xaniyan bêhtirkirina derfetên ramyarî pêwîst in, ku ne tenê çareserkirininên bazirganî li dar kevin. Ev ramyariya xanenişîniyê wê ji bo her kesekî be. Ji bo bi serketina vê, gerek e, ku derfetên taybetmend ji bo peydakirina xanî bihên dayin wek nimûnê, ji bo ciwanan, kesên bi temen, bêkaran û bêxaniyan were bêhtirkirinê.

Em ni karin bêjin bazara xanenişîniyê kêrhatî ye, heger gelek kes, bi taybetî jî jin û kesên bi temen xwe di taxên xwe de neewle hîs bikin. Her wisan jî em ni karin bibêjin bazara xanenişînê ne kêrhatî ye, gava xortên gihaştî ji ber nebûna xanî bêgav dimînin li nik dêbavan bimînin. Gava xort gihaştî bin û bixwazin ji malê bar bikin, divêt derfeta ji xwe re peydakirina xaniyên baş û bi lêçûnek normal hebe.

Garantiya kirê (hyresgaranti) derfetek baş dide, da ku mirov ji xwe re xaniyên xwe yên pêşiyê bi dest bixe
Pirsek ku dikare asteng li pêş ciwanan ji bo barkirina ji malê derxe ev e, ku xwedîxanî dikarin ji vê bitirsin, ku kiriya wan her meh ne yê gava ew xanî bi kirê bidin ji xortan re – ew xortên ku ne xwedî xebatek berdewamî ne. Lê belê divêt em ji bîr ve ne kin, ku her wisan xortên xwedî derfetên aborî ew ên dikarin kiriya xaniyê xwe bidin, carinan

dikarin li ber daxwaziyên aborî yên xwedîxaniyan rast li dijwariyan werin.

Ji bo hêsantirkirina ji bo ku ciwan bikaribin ji xwe re xaniyek bigrin, em dixwazin piştgiriyek dewletî pêk bihênin ji bo wan şaredariyên, ku dixwazin garantiya kirê werbigirin. Ev dihêt wê wateyê ku şaredarî garantiyê didin, ku dema pirsgirêgek derkeve, kirê wê dîsan bihê dayinê.

Gelek xaniyên nuh, ku me hêza aborî heye em tê de bimînin
Me Sosyaldemokrat di hilbijartinên sala 2002'yî de soz da, ku em ê di navbera vê salên xwe yên dolîwgeriyê 120 000 xaniyên nuh ava bikin. Ev soza me wê ne tenê were cih, her wisan jî em ê ji ser vê soza xwe bêhtir jî bikin. Lê ev tenê ne bes e. Ji bo cîbicîkirina pêwîstiyên xelkê, em ê li ser riya avakirina xaniyan berdewam bin tevlî derfeta avakirina xaniyên ji bo bi mafê kirêkirinê jî.

Ji bo ku em bikaribin xaniyên bi lêçûnek normal ji xwe re ava bikin, divêt ku em di aboriya xwe ya Swêdê, rêkûpêkiyê û fayizên nizm peyda bikin. Lê her wisan jî me sîstemek divê, da ku em bikarin li ser derfeta avakirina xaniyên nuh bêhtir bikin. Ev dihê wê wateyê ku derfet ji her kesekî re çê dibe, ku ew bi hêsanî dikarin ji xwe re kiriya xwe, fayizên xwe, pereyên lêçûnê nuha û li pêşerojê bidin. Divêt ji bo karê lêkirina xaniyên nuh, derfetên herzankirinê werin holê. Em dixwazin li hevberî monopol û şebekeyên li nav branşa xanîavakirinê têbikoşin. Her wisan jî em dixwazin bêhtir ji erdên dewlet û şaredariyan biêxin di nav beşê erdê ên xanîlêkirinên nuh. Em dixwazin domana pîlankirina xaniyan kurt bikin û her wisan jî bêhtirkirina derfetên nişteciyên şaredariyan ên beşdarbûna nav karê pîlan û avakirina xaniyan.

Em ê xanî û taxên bajarê xwe şên û ava bikin
Her çend ku li ber wan welatên din, em ên li Swêdê xwedî xaniyên baş in jî, dîsan gerek em rewşa xaniyên xwe baştir bikin. Domana li dervehiştinê (segregation) divêt were şikenandin. Gelek ji malbatên swêdî yên xwedîzaro û her wisan bêhtir ji malbatên swêdî yên ji kok û binyad ve ji derveyî welêt in, xwedî xaniyên biçûk in. Me pêwîstiyek giştî heye, da ku em avahiyên heyî çaktir bikin. Li nav van 15-20 salên li pêşiya me, wê ji nîv milyonê bêhtir apartman û xaniyên biçûk werin çakkirinê – her wisan jî li nav herêmên bernameya milyonî (miljonprogram). Li dema van karên çakkirinê, wê xaniyên kevin jî werin çakkirinê da ku wan enerjî kêm (energismart) bivê.

Kirêkirina xanî derfet e ji bo her kesekî
Ji bo şikandina domana li dervehiştinê, pir grîng e, ku gelek formên cihêreng ên li taxên me hebin, ên wek; xaniyên kirê (hyresrätt), xaniyên milkî (bostadsrätt), xaniyên kirê ên koperatîfî (kooperativa hyresrätt) û xaniyên biçûk ên milkî.

Divêt lêgerîna li pey xanî hêsan be û merc û hoyên kirêkirin yan kirrîna xanî divê diyar bin. Divê li şaredariyan ji bo wan kesên ku ji xwe re li pey xaniyekî digerin serwîsek baş hebe. Her wisan jî divêt li hevberî li dervehiştina li bazara xanî lebatek aktîf û xurt hebe. Divê kirêkirina xênî bibe para her kesekî. Ji ber vê hindê em dixwazin garana giştî (allmännyttan) pêş ve bixin – ne ku wê bifiroşin. Garana giştî dibe alîkar, ku kirêcî li tevayiya taxên biçûk û mazin hene.

Alternatîva vê
Li hevberî vê ramyariya me ya xanenişînîya çak, ya ku dibêje xanî mafê her kesekî ye, ew hevbendiya rastê ya di bin dolîwgeriya Moderatan heye. Ew dixwazin kiriya bazarê, firotina mafê xaniyên bi kirê û qutkirina piştgiriya civakê ji bo lêkirina xaniyên nuh pêk bihênin. Moderat û ew hevbendiya wan a baskê rastê, xwedî wê ramyariyê ne, ku kargêriya civakê her dem kêm bibe û merc û hoyên bazar her dem bilind bibe.

Li wî welatê Swêdê, ku dolîwgeriya hevbendiya baskê rastê heye, bi tenê avakirina xaniyên ku qezencê dihêne û derfet tenê dihêt ji wan kirêciyên ku qezencê peyda dikin.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?